PÎROZ BE
VEGERA LI XWE

# Dilêra Min

**PÎROZ BE VEGERA LI XWE DILÊRA MIN**
Mahsûm Dîma

**Çîrok:** 07 / 19

**Gerînendeya Weşanê**
Eslîxan Yildirim

**Sererastkirin**
Baha Khan

**Berg û Rûpelsazî**
Dawûd Rêbiwar

**Çapa Yekemîn**
Weşanên Azad, 2022

**Çapxane**
Bizim Büro Matbaa Dağıtım Basım Yayımcılık
San. Tic. Ltd. Şti. Sanayi 1. Cad. Sedef Sok. No: 6/1
İskitler / Ankara
**Sertifika No:** 42488

**ISBN:** 978-605-81463-8-9

**Navnîşan**
AZAD YAYINEVİ
Viranşehir Mah.34330 Sk. No15 A/4
Mezitli/ Mersin
**Sertifika No:** 40407

**WEB:** www.wesanxaneyaazad.com
© ***Mafê wê parastî ye. Ji bilî danasînê bêyî destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.***

**MAHSÛM DÎMA**

PÎROZ BE
VEGERA LI XWE

# Dilêra Min

AZAD

## PÎROZ BE VEGERA LI XWE DILÊRA MIN

şeqama ku min li ba dixist
nediyariya bi valahiyê ve daleqiyayî
dem rencûra jiyanê hîn dike
qolincek ketiye mîdeya min
laşê ku giyanê min
dikişand nava xwe

Mûsa hêj behr derbas nekiriye
ev xwarina dawî ya Îsa ye
Mihemed belkî
cara dawî dimeyizîne li Hîrayê
û xwîna ku ji laşê Babek diherike
mehdê min zer dibe

eyy Zerdeşt!
leşkerê me bide me
yên ku ji artêşa Medan mane
ev ne hîleya pêşî ye ku xweda bi me dikin
ne xapandineke dawî
çi ferq dikir
yek ji rêgeza jiyana me bû;
“şer bike”

em ê şer bikin, carina sîng bi sîng
carina bi xef lê dê reva me ji xwe nebe
çendî em bikişînin jî janên dexezar
nelorîne ji bo me, şînê girê nede
di rojeke wiha de em ji dayik bûbûn
kengî bû
çi wext bû
çi hewce dikir dilêra min
qefesa zexm a li ser hebûna me şidiyayî
va ye bi tifa diya min tîş bûye
tif bike celadên xeyalan jî dilêra min
û pişta xwe bide siya welatekî
piştre em ê dîsa bi hev re biqîrin
şer bike
şer bike
şer bike

delaliyên di serpêhatiyên me de winda bûn
wekî pêşrewek
jînê razên me mêtin

û kendala em jê ketin
xapandineke dîrokê,
vegera wê her heye

heqîqeta li pêş me diçe
artêşek e,
carek din li benda hatina me ye

û mirovên her diçin mesex dibin
tariyeke biheşêfk
wê jî jê bibe
bila tu şop nemîne

pêşî, em ê bi xwe re şer bikin
piştre bi çarenûsê re
ku ji tunebûnê em tune bibin jî

rabe lome bi me nabe
stêrkan çav li me şikandiye
şev wê îşev ne bêbext be

di nav çiyayan re bimeşe
danekeve deştan
bajar ji zû ve hilweşiyane

janên xwe li dilê xwe veşêre
weke min
dê agirê wan me germ bike

hemû deng wê gazî me bikin
em ê li ber bayê wan nekevin
û em ê ji nebihîzî ve bên

hezkirina me
hesteke bêtixûb
gihiştina wê ne gengaz

duh di demê de xwe veşartibû
îro dê dîrok biqîre
wan awirên me yên betran

asoya nexuyok
xewna ku li xwediyê xwe digere
me rojek din ji roja diyarkirî derbas kir

vegera li xwe
pîroz be dilêra min
bi şertê ku carek din derneyê

di awirên westiyayî yê zarokekê de
xeyalên ku
hiş leyan kirin
destê pixûtî
dilê xwîn jê dihat
difetisim
dixeniqim ji nebûna xwe

şanaziyek e dîsa
me girt û bi xwe re bir
li dema payîzê
ji dengên xîzxîzok
ji rîpelên zebûnan dûr

qijîn êdî bê feyde ye
ji ahênên dubare re
wê stêrk bixuricin dizanim
di tehma şeveke biharê de
bi hilkişîna çiyayan

Yekemîn rûpelê çarenûsa xwe me li vir nivîsîbû dilêra min, bi dilşadiyeke serberz, di rêwîtiyeke birçîbûyî de. Dengê kewa gozel, bilbilê cîgersot bûbû newaya strana vê rêwîtiyê. Pelên payîza zerbûyî, dîmeneke bikovan bû ji wan çavên xencerî difûriyan.

Di her demsalê de rengek bû rêwîtî, bi hîskirina dilan. Ne sînor hebûn di ramanan de, ne tebatî. Welat di gêjgerînka ramanan de diherikî ser deryaya dil. Ev fûrîna wê bû. Wê jî dizanî bêrîkirina parçeyên xwe yên din. Biherike, nesekine. Her sekin pinîtiyek e ji meşê re.

Ji dîroka xwe biçêre hestên xwe dilê û binivîse çîroka xwe. Çawa çîrok û çarenûsa te bû yek, va ye pevgihanka hêlîna te bû hêvî.

Nebêje çi bû û dê çi be, bimeşe. Dil çi qas bi hêz be taqet jî ew qas.

BI PIFKIRINA EHMEQAN RONAHIYA STÊRKAN VENAMIRE…

Heyv nareve. Lê welat ji bêxwedîbûnê dirûxin, ji bêbextiyan. Bêbextiyê jî bikuje, bikuje da ku bextê me bibe kenek li ser lêvên dayikên me. Bila hesûdiyê bikin çavên xirab, şoxiya te dê çavan biberiqîne. Hinavê me dê şeng bibe ji xayîsiyê. Em ê ji bîr nekin qozeya xwe. Bi hesreta vegerê em ê biçin lê em ê vegerin; li xwe, li xewnên xwe.

Şeh bike ji rojê re porê şevê, kêliyekê. Û heyvê bitewîne ber bi xwe ve, stêrkan bixe pir ji xwe re. Wê ferîşteh li ser çokên te razên. Dema ku me pesnê tenêtiya xwe dida...

yên destên xwe ji ezman re radikirin
niha berê xwe dane xwe
û axa bin lingên xwe maç dikin
pîroz be vegera li xwe, ey dilêra min!
valatiya nedihat fêmkirin
bêwateyiya awiran
ji axînan bêtir xwe digevizandin li jariyê
ma ji destpêkê ve wisa bû? na!
her rê derdiket warekî, yan jî dilekî
çûyîn bû her tim hêleke me
hêla din mirin.

Ewrên li ezman jî ew qas zû nediçûn, wek qêrînan. Xwedawendek rakêş û xwedayekî azad hebû di nava me de, kengî dê derbiketa nediyar…

Jixwe ev nediyarî bû kujerê me, ya ku di her çirkê de hilm li me diçikand. Çend neyar hebûn me dikuştin? Li her derê… Negere li devereke din. Li ber xwe dida di nava me de wek hûtekî
"XWENEBÛYÎN" êşa me ji vê bû.

Hedana min nebû, dema ku bi ba re diweziyam ber bi te ve,
rawestan mîna rimekî çikiyayî li dil
axa bin piyê min li ber xwe dida
ji têborînan
têborîn axx têborîna ji xwe
har dikir rêwîtiya nava min, lewma min bajarê nava xwe terikand.

Di her rozeriyê de li ber guleyeke bênavnîşan
min navê te li giyanê xwe dinivîsand dilêra min
ji çirîska awirên te stêrkeke keser dibarand, digurijî dilê min bi wan awiran.

Wek demûşê bi min ve dizeliqî delaliya te,
di bin baraneke bêdem de.
Bîskekê em wisa bin
bila dil ji kaniya hev vexwin
mîna avek ji ava qudretê

## DI EVÎNÊ DE ÇIKÛSÎ NABE,
## PIŞTÎ KU DIL TÊR NEBÛN JI HEV

Laşê xwe ji mirinê ra radixe, lê wê nemire ev evîn.

Kovaniyeke zirav, ji kûr, bi tirûş hestên min dikola.

Niha birîndariyek bû li peyvan, ziman di deryaya çavekî de dixiliqî. Hew fêm nekirin elema nava me ji dilkujiyê…

çiya nepixîbûn
di asoya hizrên min de
ji ber ku
dilêra min dimeşî li ser
bi gavên şidandî
firazwer
û neqş bi neqş
bi tewqkirina delaliyê

heçko
helbest dinivîsand bi meşa xwe
wisa ji dil
wisa rakêş
wisa bi evîn
dilê min bijiya carekê

Min qêrînên nava xwe terikandin di wextekî şevê de, bi xayîsiyek ji dikêşiya te.

Barana ku bi ewran diket û sermaya ji berbangê ve sewta giriyê erdê netepisand.

Mîrateya ji kalik û pîrikan ve hatî
têkçûyînên bêqidoş
hizrên hişê min rûxiyan.

Helbet wê nû pel bide derhozeya me, ji ketina dûr.

Bi helkehelk, li ser sînga dayikeke parçebûyî.

Lêvên ku giyanên me dimêtin û hestên me di bin potînên xwe de diperçiqandin, ji semyana te dilêra min dê bilerizin, dê bifetisin, dê birevin lê wê quncik nebin ji bo wan.

Û dê stêrk bi dilbijokî li te binêrin. Yên ku bi şewqa xwe ji te re bûn kelecanek, belkî neyê fêmkirin serhildêriya te, lê çêja wê hîna li ser dilê min.

Xeyalan di nava şerekî tirsnak de

xwe pal dane hêviyan û li ber ronahiya heyva penaber dilan stranên azadiyê distrand. Bayê bakurê ku bêhna axê jê dihat

û bêhna te hestên tenik ê giyaşirkî bajen dikir. Hizr di riya razên bi sêhr de.

Ew bêamaniyên çûyînan, rêçên ku li xwe vedigeriyan 'xwe'yên ku li pey rêça xwe nediçûn.

Kifşek ji riyan ber bi asoyan ve…

EVÎNPERESTIYEKE HESTAN

DEM KUJERÊ EVÎNDARAN

Ji çemê eleman av vedixwar kelecanan. Yên nû bişkuvîn û yên nû bi ser xwe ve hatin li vî çemî xwe şuştin û tevan berê xwe daye te. Wan bi dilê xwe pîroz bike dilêra min. Ew cangoriyên hebûneke li ser agir, rojekê wê bibin mêvanên hestên te. Wan bi welatekî pêşwazî bike, bi dildariya zanînekê.

Tu navnîşaneke ku nûhatî pirsîn, li ser zimanekî nîv-kuştî helbestek, nêçîrvanên şemala te derketine riya bibîrxistinê. Tiştên ji xwedawendîtiya te hatibû dizîn û yên bêxwedî mayî, va ye li ser eniya xwe dineqişînin nexşeyekê, ji eksa bêxemiyan…

Nêz dibin, binêre dilêra min.

Min tehfîl bike bi raperîna ku te bi hestên xwe neqişand.

Feleka ku pişta xwe da me, dem ji zinarekî hişktir, kêrek bû me dikir çar parçe dilêra min, li wê reşetariya kujende.

Janan tu carî neterikand dilê me, jenggirtiye hemû roniyan, dicifilim ji nişkê ve, nebûna bi ser min de dihat, çarenûsa çep nivîsandî, bi pênûsa hibra wê qediyayî, wajînek bû ji dîrokê dihat.

Wek hespên ceh bixwin û serê xwe bihejînin li me hatiye dilêra min, piştî tu çûyî, dîsa dest pê kir qolincên me yên dubare, yên ku ji zayînê heya roja îro hatî. Tu carî ew qas negiriyabû dayika min, ji yên dijî re.

Kendalên ku di dilan de berz bûn, tu jî jê nekevî serkeftinekê dilêra min, ji bo jiyanê, ji bo welatê belengaz,

û ji bo azadiya ku em ji têhna wê ketine.

dojeh bi agirekî şewatok bû

lê agirê ku em dişewitandin…

axx ez nebêjim dilêra min, ez nebêjim van

hestên ku fûriyane, ez nebêjim vê êşa dil û kulên ku laşê me dirandine…

wexta birînan êşa xwe avêt ser hiş

hiş ditevizî bêdeng, di bin giraniya laş de…

lê wext e

daxe rûpoşan ji rûyan, daxe wan rûpoşên ku

hebûna me bi me didan jibîrkirin.

Yan jî biqeşitîne pelîdên ku li ser hêviyên me nijîne, bi şiyana tilsima xwedawendîtiya ku te ji şervantiya xwe girtibû. Hemû ferîştehan çok danîne û li benda fermana te ne.

Yek awirê te bes bû ji bo hembêzkirina mirinê,

weke dilê min, çawa ku di her kêliyê de ber bi te ve baz dida.

çav li riyên hatina te qerimîn
halê giyanê şewişî
û kebarek
di nîvê bihara rengîn de
pel weşiyan
ez diniqutim ser dêmên rûyê te
ji laşê min xwîn kişiya
melkemot war çêkiriye
li ser sînga min
dengê xîzxîzok ên şevşevokan
bes bêzar bûm
ji bêhna miriyê li nava ezman
bayê reş rabe min bibe
toqa mirinê xwe pêçaye
li mayîna min…

dîtin
û jiyan
û yên hatine jiyandin
bi kenekî şikestî
ji eksa hetekiyê
bi felişîna dil a di nebûnan de
û sarbûna ji xwe
ev ê ne ez bim

marê di hinavan de mezin bû
pêşî
bi te veda
hey gidîî ev çi bû
ji şûna xwînê
welatek ji laşê te diherikî.

Em man di bin bombebarana şîretên durûyan de, çîrokan ji me re dibêjin zirtoyên bêşanaz. Rûmet ji dilan xistine dilêra min, di bin lingan de can dida giyanên nûbişkuvî. Jehrên ku mejî difetisandin, kujende, ji birîna guleyan xedartir.

Lê wahaya min tu bûyî dilêra min, di her awirî de
hildiweşiya dil.
Rewendetiya min ji gijbûna hestên te bû
loma ez bûbûm parsekê serhildêriya te
netewe,
neşike
ku çendî caran hatibe şikestin jî ew dil
neçe
asoya hizrên min
ango çavên xwe
dûr nexe ji vê helbestê
bi sêhra çavên te direqisî ev pênûs
û ev dil
kerba xwe pîj dikir li ser rûyê rûpelên spî
ji bo te dilêra min
baran bûne rondikên çavên min
lehiya wê kê girt bi xwe re bir
tenê şoraxek ji min re
û tenê wêneyekî te dilêra min.

sal derbas bûn
min got belkî tu werî li payîzan
lavayên min ne gihişt guhê xwedayan
xwedawend li têleke din
dilop dilop rih ji min diçû
êşkenceyek bû hetahetayê
canê min zevt kiribû
ne Prometheus fêm dikir
ne jî rojan…
ka li ku bû azwera demê
ez ê veneşêrim gunehan
û gunehên bi me didan jibîrkirin
kolanan deng dida
bi qêrîn
bi hawar
ji bêkesiyê
kevirên vî welatî jî diaxifin êdî dilêra min
binêr li ser her keviyê şopa xwînekê
ew ên dimeşin lê nabînin
bi hemû hêza xwe, tif bike wan bi zexm
mîna kirina perestiyekê
û derbas be
bila tifa te bibe nexşa welatekî li ser wan rûyan
û bila biherike tevahiya giyanê wan
belkî hinekî biarin ew dil
belkî ji xwe biçin
û vegerin li xwe dilêra min
bi xwebûneke nûhilatî…

Çûyîna bi ser mirineke biêş de, dê kî me bikenanda bi peyvên
ku ji tenêtiya me hilpekiyane. Yên kefenê mirina xwe çirandin
netirsiyan ji mirinê, ji hezkirina jiyanê jî.

Me cewherê xwe ji tilsima evîneke destpênebûyî girtibû,
hestên xwe em ê bi azadiyê bimeyînin.

Lewma wate bûye destpêkek ji vê jînê re, di her dijwariyê de.

Serhildêriya ji lehengan vebeyandinî giyan bûye xeyal bi ser
me de xuricîne.

Çiyayan bejna xwe raxistiye ji van xeyalan re.

Erê dilêra min geşbûna agirê nava me
ji pifkirina bayekî pîroz bû, hêj nehatiye bahoza ku dê hestên
me vebibêje.

Bi hêrseke şeydayetî dilê xwe hilde û were, karwanek derketiye
nêçîra mirinê, li welatekî nemir, bi tirsandina tirsê re.

Aso gazî me dike ji tenêtiya xwe
em êdî bi rê bikevin dilêra min.

kêliyên ku li ser bijangên min direqisîn
kovaniyeke ji dil difûre
bajarek ji serma dilerize
heyvê xewnên min gez dikir
efsûneke li wan çavan
di vê şeva tîrêş de
û tenê tu tê bîra min dilêra min
bi çîrokên ku
ji ser zimanê dayika min dadiwerivîn…
û perperîka ku
kenên min li ser baskên xwe kiribû
berê xwe dida dilêran
min navê te li ser agir nivîsî
axînek bû çîrûskan dikişand…
xwîn hê jî diherike
ji vê birînê
û ez ê gazî dayika xwe nekim
ya ku her tim
bi destên xwe yên dilovan
serê min miz dida
li ber bombebaranên kujende…

Ehrîmanê ku destên xwe kir qirika hêviyan

her ku me dûr dixist bi bêhneke bed nêz dibû.

Kêliyeke dawî ye!

Ji nû ve dest pê dike şerê me, bi xewnereşkên tirsnak re,

Min got: Bila were! Bi hemû fêlbaziyên xwe.

Yên bikevin dê ne em bin.

Di tariya wê şevê de, bihevrebûna stêrkên ku li ezman
direqisin, em bi wê mirinê dikeniyan.

Ewa tehl û ji dayika me bêtir nêzî me.

Na nebêjin tu çima wiha dinivîsînî, min jî dixwest di nav
pel, gul û sosin û rengîniya biharê de

tiştên xweş ji pênûsê biverişînim.

Lê rastiya bi jan her min dikişîne zikê xwe.

Carina dil têlmaş dibe ji tunebûnê
carina hiş difetise ji bêdengiyê
bêqarîn,

lê her em bi tenê bûn dilêra min.

dilê min ji sitargehan tijî bû, tu jî xewneke
xwe lê raxe dilêra min, bila pel bidin kulîlkên te
ji demsalan xalî.

Mîna tirsa zarokeke biçûk dê li felatê bigerin hest
û nepirse çend qeyd li wan hatine xistin
ji newayeke sotîner pêtek belav dibe û xwe
li qeraxên sewdaseriya şevê dide.

Şev serxweş bû îşev ji şevbûnê. Û ferîşteh
daketine ser dikê, pêşreweke bi saw!
velîsk derbas dikin nemûşên lewçok, li hember
tunebûna xwe ya çilmisok
û lemek di belûriya rojê de
bi laporî
hemû çîrokên me hedimandin.

Xem nexwe dilêra min
em ê nemelisin di kolanên tarî de, ji canzeran
loma em ê bijîn bi mirina xwe re. Mirinek dê bibe
hebûnek ji bo jiyanê
bi eks em ê bijîn
di her bîrên asîdî de
di her goreke komî de
di her newalek bêdeng de
em ê hilm bidin û bistînin, bi hemû toqîna xwe
dê dil biçizirin dilê me
dil dê bibin cih ji dilan re
û dê rê nemîne ji nebûnê re.

Li ber bayekî hênik ê payîzê xwe bi ser min de xwar kir û razek teqand di ber guhê min de dilêra min.

Laş tevizî, dil peritî di qefesa xwe de. Hemû hestan yekser êrîşî min kirin. Bi razberî hiş raman didoşt ji nediyariyan. Geraviyek û reva ji xwe! Ber bi tunebûnê ve. Ez ne ez bûm gelo? Lê tu? Ji nava şevê dengên ku li valatiyê diketin. Stêrkekê ji heyvê re çav dişikand. Yan sawîneke çav bû? Belkî jî xwe xapandinek!

qêrîneke bêdeng
ez hîs dikim
pir ji nêz
va ye di bîra min de ye, ya ku gazî min dike
tu li ku yî
an jî ez li ku me?
rewşeke bi raz
wek raza dilêra min
bi ser min de xuricî û li benda min e
di dîrokeke nenivîsandî de
yek rûpelî behsa me nekir
ji xencî xwe dîrok!
rû neda, dilêra min
rû neda ji yên tên zanîn re
bi canzeriyekê got:
"hadê bimeşe, ber bi ya nayê zanîn ve"
ewa ku dê rojekê bê zanîn
û meşa
ez hîna li cihê xwe bûm
hiş li ser gotina dilêra min
"jiyan winda bû em herin di mirinê de lê bigerin"

di guhê min de diçingînî
strana lalan
li ber peravên evîneke bêsiûd
ji dilekî evîn diparzûniya dilekî
war tune bûn.

Her li ba axê evîngehek bû
ji axa ku bi hestan pijiyabû
di her gavê de hesretek
ji vê wêdetir nebû para me
wekî kulîlkên ku
bi bahara xwe şa nebûn
her demsal zivistan bû êdî dilêra min
sar
û sawnak…

Di welatê xwe de em bêwelat man dilêra min
nebû para me kulmek ax, ku em li ser bijîn.

Bêtirs, bêkuştin û bêwindakirin.

Ji janan dîrok jî diqîre binêre:

“Hey gidî! Ev tev berhema min bû?”

Rêz bûne li pey hev û li dû hev, tev ji me re mane.

Me para xwe girt dora kê ye dilêra min?

Berê xwe bide asoya çiyayan, xwe palda xeyalekê
û li welatekî ku hebûna wê bi sêdarê ve hatiye darvekirin
binêre. Tevî zarokên wê,
tevî kolan û bajarên wê
tevî xwezaya wê,
bifikire û binêre dilêra min, tu çi hîs bikî
ez jî wê hîs dikim, ez jî wê dijîm.

Mesela li Nisêbîna dilê min bifikire, ewa ku xewnên
zarokatiya min di hembêza xwe de mezin kir û kuçeyên
xwe ji lîstikên zaroktiya min re vekir

Bifikire dilêra min bi destê sîsarkên serdemê dilê wê hat
guvaştin, wekî dilê min. Û bêje nesekine.

Bêdengî bû kujerê me her tim. Bêsedem me dibir yek
bi yek. Ew têr nebûn ji mirina me, lê em jî têr nebûn ji
jiyanê, ji evînê dilêra min.

Lê geş dibe, xweş dibe agirê hinavê me
pêl bi pêl me bi sêhr dike, serxweş dike ev jiyan, ev evîn û
serhildêriya li hembêza pîrozweriya te…

## JI TARIYÊ DITIRSIYAN LÊ PIF DIKIRIN ÇIRAYAN AXX EHMEQÊN ŞAŞWAZ, ÇI NAKOKIYEKE BI DÛVIK…

Lanetek ketiye hinavan, bi miriyê nava xwe re digeriyan li bajaran, bi hev re, li dû hev, bi qarewar bi rûpoşan.

Stêrk ji ezman weşandine
hiş ji seriyan.
Tenik bû tayê di navbera mirin û jînê de.

Lê yek alî bû em dimeşiyan, bi xuricîna dengan.

Me dilê xwe jî qewirand ji hêlîna xwe.

Deng nekin, bila bêdengiya nava min biaxive.

Ji zû ve ye zimanê wê qedexe bû. Belkî ew jî bialêse miriyê nava xwe,
yan jî hestên ku ji xwe re kiriye goristan.
Li ber her rawestgehekê janek
hinek ji wan dûr û hinek nêz…
Rabe miriyo!

Lanetî ketiye hinavan, diverişînin laneta xwe
bi kenên badekî û bi gotinên beriqandî.

Û fermanekê dîsa li ser serê te digerînin
dê çend caran te bikujin, bi guleyên bêwext.

Tovên lanetiyê
bi qufilandina beyaniyekê
wêran kirine germahiya dil
ew kenên li ser lêvên cemed
ji bêpaxaviya nebûnê
û dijwariya êşên jakaw

hejkek çêkir li giyanan
lê ez ê dîsa bêjim
rabe miriyo!
Laneta nava xwe bibîne
beyî ku sîsark kom bibin li ser laşan

Çirûskek ji agir xwe ji bîra sedsalê werdikir
ser giyanê min, raman bêbiniya valahiyan, bifikire

heman tişt, binêre heman ezman, bibêje heman gotin,
û were bipirse dilêra min
'Heman jan!'

(Sisyphosek di nav me de ye, henekên xwe bi çarenûsa
me dikirin xwedayan, li vir bûya Eyûp dê ji îmana xwe
biqeriya)

û erê min nediqdiqînin bi dilminiyan
Îsayê çarmix li ser piştê
li girê Golgotê

bi destê kê hat kuştin?

Sokratesê mirin bi destê xwe dehf da
bi kîjan hestên nijînî

jehr bi ser dilê xwe de kir?

Ev hêrsa bêhedûr, ku ji nav rûpelên dîrokê dipeke, va ye li
ser hêrsa dilê min xwe dihejîne.

Ji vê ye qêrîna min dilêra min, axx ewa ku ji min pê ve

deng nediçû tu kesî.

Ma Îsa dengê xwe gihandibû bavê xwe, di qelebalixa yekkesî de.

Her der bû dikek waweylê.

Hey gidîî! Çi kambax e, mayîna di gewriya hûtê heftserî de, ne daqurtandin hebû ne xilasî! Ha-ha dicût hestiyê canê me, yên bêçerm û li ber şikestinê.

Ya me jî tev şerekî bi xwe re bû, di dîmenekî zar de, hew ew qas, ya ku wê behsa me bike…

ji konên qereçiyan xirabtir bû hestên qelîştok
berbelaviya xenên bişengî
parîxwariya demê
û çavên ji rê derdixistin
ÇAV KEMÎNA DIL BÛN
wê tazî bibin giyan
ji tunebûnê
marên reş xwe pêçane li zimanan
gotin wekî jehrê bûn êdî
bêtebat dil dihedimandin.
(me sînga xwe vekiribû ji şerekî bêaman re lê niha em bi
siya xwe re pev diçin û gazî miriyan dikin dilêra min)

ji ezmana bêser û bêber
birûskên ku li riya me diketin
bi gavên lengî em dimeşin dahatûyê
qey wiha bû jiyîna me
kelecana me
ya ku di her çirkê de
me li ber xwe dibir
çîrokên me
(bi dîroka me re)
dibû pêtek û
laşê me gez dikir
lê em ê bi germahiya çavên te
bikelin dilêra min
ewên birçiyê dilê me
ewên sedema pîrozweriya me
sêhrek diherikî ji wan çavan
veşêre awirên xwe
di helbestekê de dilêra min
belkî biqedîne bêwatetiyê
belkî tune bike xwejibîrkirinê
belkî bifelişîne welatkujan
di mirêsa evîna te de…

Bêje dilêra min
ez çend parçe bûme di xefka awirên te de,
Bi eksok, dema ku hilm li min diçikand çavên te.

Xilasiya min tune ye dizanim, lewma di gerava bêçaretiyê
de min dest ji xwe berda.

Mejî bêlebat dil diperpite di qefesa xwe de.

Tu Xwedawenda hêviyên min

em ê şadiyan kom bikin ji te re
ji ser sînga xwe
bi xwedawendên vî welatî re
mîna tehfîlkirina hebûna xwe
dê bêhna welat ji wan re
û bêhna te
em ê pê gêj bibin
em ê serxweş bibin
û dê bifûrin ev hest ji bo te.

Heyverona geş, stêrkên li ser bijangên te civiyayî, bi rengê
kesk û sor û zer de bixayisin.

Şevên reş dê bibin balgîf ji hezkirina me re…

Bêwarmayîna me em kirin rewendeyên salan.

Me demsal ji bîr kirin êdî, roj bûn bîrên mekuştinê, her
kêliyê yekî ji me dadiqurtîne.

Neçar, em ê xwe bispêrin te û xwe bispêrin axa welat
dilêra min,

ew ê bipêçe xeyalên me
yên ku di cengê de ruh dida me…

Erê dilêra min, wî şervanê nava me jî şiyar bike bihejîne bi zexm û rê bike ji evînê re.

Dê çavên wî li xwe, ne tenê xaka welat, bayên wê jî dabeş bûne bi sînoran, di her demsalê de ew jî qaçax diwezin li parçeyên xwe yê din… Cemidîna laş û birûskên ku di dil de diteqiyan ji vê bû, ji vê bû qêrîna ku laş dikir çar parçe… (Çilmisandibûn kulîlk, têr bûye dilê min êdî ji gotinan. Razan miz didim û maç dikim serê nepeniyan)

Di her lêdana dil de –bi çargopalî- bêrîkirin diherike ji çavên min, ji bo te dilêra min.

Dê ziwa nebin kaniyên bîranînan, dê ji ber neçe şerê me yê bi jiyan û mirinê re. Dil bûne keleh, ew ê bibin mîrate di çiyayên me de. Ewên nehejok, ewên berz û mezintirîn xweş stargeh.

Dê were bihara me
gul û kulîlk dê bi rengên me bikenin,
hemû newa di yek stranê de wê kom bibin
û bi yek awazî dê şadiya me vebibêjin.

Em ê ji şadiyê netirsin dilêra min
û ji janan…

Du diyardeyên gerdûnî -şad û jan-
li laşê me serwer
ewên deryaya me biafirînin, bi dilopên tirûşî…

remza qêrîneke serhildêr
li ser çarenûseke nenivîsandî
erê ji wir dihat deng
ji wî bajarî
na na ji wan kavilan
kê bihîst
kê hîs kir
tariya bi ronahiya agirê laşan diçiriya
kê dît
wijdanên riziyayî
zimanên jenggirtî
bû para me belkî tunebûyîn
em nabêjin;
“ayy yadê û uyy yabo”
giriyê me dê venegere neçariyê
elem li ser eleman rêz bibin
li eniya me
wê nebin zêmarên xwekuştinê
sîtemên me
va ye em ê ezman raxin
li ber piyên te
da ku ji xewnên te bipekin çîrîsk
bi ser xewnereşkên me de
rêçên evînê li ser hêviyan
bûye balgîf azadî ji hebûna me re
bi te re dilêra min
bi te re…

min janên xwe
di birîna dilê xwe de veşart
bêyî ku kesî pê bihesînim
xwîn ji wan diherikî
wek volqaneke xilavsor
tavê dil ziwa kir
hembêz bike xewnên xwe
şewqa wê dê biçûrise awiran
helbet ez ê jî xwe binasim
ji çîroka te
ya ku lehenga wê yek kes bû
hest herikîne bi ser tenêtiya min de
nizanim çima
te tînin bîra min
carina di kolanên tarî de
carina di taldeyên bixof de
te diqîrîn dilêra min
bêaram digerim.

her ger
min li te vedigerand
min tu ji baranan dipirsî
deryayan bersiva min dida
di rêwîtiyeke bêbend de dimeşiyan
rê stûxwar bûn
ji kederên domdar
Ji toz û dûxana li pey derewan
rastî bi erdê ve dixijiqîn
û ez li benda hesreta dîtina bedewiyekê
ji hêstirên min lehî çêbûn
bajar di bin siya ewrên dexezar de
dirêj bike porê xwe
ber bi min ve
bêyî ku bi bêhna gotineke sar, bifelişim

bareşek
û valahiya nava min
dengê ku li dil olan dida
ji bêdengiyê têr nebû
têr nebû dilê cilêz
ji kerasetên tewtewe re
dilêra min,
dahatûyên bêcih
cihên bêmirov
di kêliyê de li hev aliqîne
ew kêliya nediyar
rêçên min jî bi xwe re birin
ba niha pif dike razan
tayekê laşê min girt
ji ku hatibû ev êş
ya ku bêdaraz ez dikuştim.

wextek bû
(kengî bû nizanim)
kêliyeke bilayş
di wêneyekî matbûyî de
kenê li ser lêvên te,
dimêt gerdûna min
hew ew ken mabû
ya ku ji lûtkeyên çiyayekî
dawerivîbû ser sînga min
tu dûrketin
ev qas ez neêşandibûm dilêra min
li vî welatê bêkes,
bi qewlekî xwedayî
dê bibare ev hezkirin
bi misêwatî
wekî helbestekê
wekî stranekê
wekî romanekê
li hember hetera danjibîrkirinê.

şev
rencûra ku daketiye ser tenêtiya min
wexta li pey şopên heyvê ketim
di çîroka bajarekî de ez
li tiştên aydê xwe digeriyam
nebûna te dilêra min
wekî demeke bêwate
û hestên ku
min di dilê xwe de rizandin
dengê çûkên berberok
û guleyeke tewtewe
dihat li mejiyê min diçikiya
biqedîne êdî vê bêdengiyê dilêra min
biqedîne
ewa ku di hikma mirinê de saz bûye.

çavên bi kovan
li nav hewirzeyeke giran
û hêrsa ku ji kûrahiyê dihat
parçeyekî xwe
li paşerojê bihêle
parçeyê din
li riyeke bêveger
belkî li lûtkeyê em bigihijin hev
û belkî em hev ji nenasînê ve bên
derb û nîvek şûnde mirin bû
dema dest bi jiyanê dihat dayîn
kezebşewitiya min
ji payîzan têr nebûm
pelek bû di giyanê min de diricifî
wexta min daristana xwe winda kir
divê em ji serî ve dest pê bikin
me li ku danîbû laşê xwe
ji kîjan welatî em heşifîbûn
bêsekin dilêra min
bêtêxim divê em li wir
li xwe bigerin.

cihekî talde
tirsên wê di nav de
xewnan hembêza xwe
vekiriye ji dilan re
ez ê dîsa xwe bispêrim
siya çirîskên çavên te
dê bîranîn hişê min bikolin
agir dê bi hestên min germ bibe
giraniya gotinên sivik
û toqîndar
dê dilê me nehedimîne
lê ez ê ji xwe dûr bikevim
bêyî ku ez te pê bihesînim
di demeke sûket de…

va ye binêr
kesera ku tenêtiya min dianî ziman
axînek li raboriyê
hemû çîrok te diverişin
bi gotinên stûxwar
dahatûyên berbelavbûyî
di zaroktiyê de
hêlînên ku min ji heriyê çêdikirin
kaniya min jê av vedixwar
quncika ku min xwe tê de vedişart
û hemû tişt qediya
yek ez mam li paş
yek jî
rondikên ku ji çavên dayika min diherikin

fermanek derketiye, nediyar
bi peyvên rûsar, mikûsok,
benê di stûyê min de
wekî serhildêrekî li ber sêdarê
ji nêz dengê celad tê
hîs dikim
cixîzî tune ye dizanim
min hilbijart vê jiyanê
ez ê biqedînim
bi te re
lê bêyî te dilêra min

Dildariya ku tovên xwe hêşîn dikir, li ser deşteke birîndar, azadiyê hêrs dihonand di berbangê de û sîsark dihatin kevirên gorên me dialêstin.

Bêwateyiya mirinê, êşek bû li serê min raseliye, îro jî ez ê xwe li bayê dilê xwe bixim.

Eyy hemû ketiyên qulibandî!

Va ye Cûdî destpêka hêviyeke nû. Belkî careke din siûdekî wisa tune be. Lewma bila rawestgeh nebin miringehên we. Her mayîn xwekuştinek e ji destpêkan re. Û bimeşin dahatûya ku hûn ê ji zikê raboriyê derbixin. Çavkanî tunebin dê çem bimiçiqin. Ji ber vê ye rêgeha xwe saz bikin. Av bila weke Ferad bi tebat, wekî Dîjle dexezar, wekî Mirad şad û wek Avaşîn nederbasok bin. Lê şiyana hêviyê her xwe berz bike li ser dilan. Ev e mizgîniya bêdawîtiyê dilêra min, ya ku her kêliyê, her çirkê, ji hebûnê ber bi xwebûnê ve diherikî. Bi misêwa…

min êşa xwe ji avê re got
çû ji min re lehiya xwe anî
(ez nesekinîm û meşiyam)

min derdê xwe ji axê re got
çû ji min re erdhêja xwe anî
(ez nereviyam)

min elemên xwe ji ezman re got
çû berq û birûskên xwe anî
(ez netirsiyam)

û min birîna xwe
ji dayikeke Kurdistanê re got
çû laşê zaroka xwe ya parçebûyî anî

û va ye
ez ji hingê ve mirî me dilêra min
ji hingê ve tunebûyî.

Wê bi çîrokên me bisincirê aliyê sar ê mirinê û dê mirin
me nas bike çawa ku di her kêliyê de em wê tehm dikin,
li van kolanan û di bin baranên ku hizrên me ji tirs û xofê
dişuşt. Tirsa me tu car çênebû ji mirinê dilêra min, lê tirsa
me her çêbû ku em careke din te nebînin.

Belê, rojek ji rojan ew tovê yekem ê ku me di vê xaka
birîndar de çandibû, dê ji wan dilên serhildêr hilpekin.
Belkî bi dînîtî û şeydatiyekê, belkî bi meqeresiyeke
nebes…

Tîrêjên tava ku rûyê xewnên me miz dida, giyanek li
pesara evînê, wek helbesteke nepixandî biteqe êdî û XWE
ji nû ve binivîse, bi parçeyên xwe, yên aydê xwe, vegera li
xwe pîroz e dilêra min bi xwe daweşandina ji biyanîtiyê…

Em em bûn, em ê wisa bin.

Çend caran hatibin parçekirin jî giyanên me
xeyal çend caran hatibin pelixandin jî
û çendî hêvî hatibin rûxandin…

Em tên dilêra min
Xwedawenda xwebûnê tu
gazî me dikî.

Yên valatiya mîdeya xwe bi têrbûna hişê xwe bi bin nexistin ketin xewa mirinê û xweliya biyanîbûnê bi ser xwe de kirin.

Hetekiyek bêhempa… Belengaziya welatê min û tîbûna ji bo azadiyê mîna barana ku bi lez xwe bigihîne erdê, yên stûxwar em…

Qelişandiye canê min vê badekiya domdar, bi çar darbeyên şûran dil xêz kirine. Ev babelata bêyom berhema kê bû? Ji sedsalê heya niha laşê min dikir parî
bi dengên kirêt
û bi dilên ziwa…

bes,
ezman werimîbûn
ji bêpaxaviyan
xemgîniya ku dil pêça
bûye lehiyeke bêqedan
di vî bajarê binax de
bi xwînê sor bûne
çiyayên bisêhr
(û çiyayên nava min)
newayeke difûre ji hestan
li ber hêlîna çûkekî birîndar
û axînên tawanbar
serî tewandine
li ber hevokeke şikestî
pêlên behreke şiyanî
li qeraxên bêdengiya min dikevin
nepirse ji ber çi ye dilêra min
ev binaxbûna bêtebat
zû bila deynin sêdara çavên te
û bila bijangên te
bibin benê li stûyê min
mirin belkî bibe kifşek
ji bo XWEBÛNÊ
çêtir e ji vê bêdengiyê dilêra min

rûyên mikûsok
dengên bêyom
dilê min diherifandin
di van sibehên bêhedûr de
ji bîra nava xwe
ez ê lehengiya te birijînim
bi ser çîrokên bêpeyv de
ji bo kelecanên min
veneguherin eleman
ez ê tenêtiya xwe bişom
ji tenêtiya gulên venebûyî
tu dixwazî min hilweşîne dil
piştî ku xwezî bi xwe anîn
xewnên kelogirî,
vêxin çiraya nava min
bila netemirin hêviyên xonceyî
belkî bibim razek
di kovaniya xwe de
di vegera xwebûna xwe de
hebûnekê bike ax
û bi ser jiyana min de bike
bi evîneke ku hê nehatiye dîtin dilêra min

Daqurtîne kelevajiyên li ser zimanan, gotin
bûne jehr û her ji tûrikên devlokan dipekin.
Guhê min diarê.

Tu dilêra min;
xweziyên xwe ji baxçeyê dilê min hilîne, ew baxçeyê di nav hebûn û nebûnê de. Ji wir dest pê bike û were. Bi pêş de. Belkî tu bibînî wê evîna dilsoj, ewa ku bi xetên janan felişiye. Di wan xetan de jiyanek heye, mirî ji wir radibin û di taldeyan de li laşê xwe digerin… Laşê ku ji wan hatiye dizîn… Li eniyan nanivîse li ku ye, di lewhayan de jî negerin. Ev welat di nav agir de welidîbû, li çirûskan jî nenihêrin.

Kêlî wekî pirekê bûn ji bo jiyînê, di nava xwe de çûyîna van kifşan, wê jî bêtirs, bi xwe re…

Rê asteng bin, em ê bi ramanên xwe bên. Em ê werin cem te dilêra min, çawa ku tu hatibûyî Xwedawenda dilê me.

Dizanim pelasiyeke dûrtiya nava me, ji dîtina te re, lê bêyî ku em bikevin ji kelecana xwe ne nêz û ne dûr her tişt bi hebûna te xweş bû dilêra min.

Rûne li ser zinarekî yan jî çiyayekî li heybeta xwe binêre û li ya derdorê… û bila ew der welatê te be dilêra min, dengê wê bibihîze, ewa ku kûr tim ji bo te diqîre.

çiyayên ku di rêwîtiya me de neqediyan
divê me xwe jî bi xwe re bibira
zarokên ku li pey me digirîn
negirîn ey dilên mezin!
hovên ku laşê me talan kirin,
em dîlgirtiyên xewnên xwe
ewên ku me ji tunebûna me rizgar dikirin
û ber bi delaliyê ve rê dikirin
yên hatin û nehatin
berde bila her kes bi riya xwe de biçe dilêra min,
em her 'ji bo yên din' mirin, lê êdî em ê parçeyekî ji bo
xwe bijîn
bi hesreta xwebûna xwe
û bi bêhna welatekî azad…

Neronê ku dayika xwe da kuştin
bêxem
bê dil
bêgirî
dilopa dawî ya hovitiyê
lanetkirina pîroziyê,
hîna qêrîna Agrîppîna di guhê min de olan dide
“Ew dayika ku ev cinawir aniye dinyayê wê ji zikê wê kêr bikin”
Erê dilêra min,
ya ew qêrîna welatê ku ji mirinê re hat terikandin?
û qêrîna bi mîlyonan dayikên min,

cureyek ji zagona xwekuştinê
JIBÎRKIRIN
ehmeqiya ku wate nedihat dayîn
riyeke din a bibîrbûnê tune bû?
"kurdên baş, kurdên mirî"
bi mejiyên hov
û hestên tarac êrîş dikin
vegerin serî
em ê ji nû ve binivîsînin vê çarenûsê
li ber gurmîna ezmaneke jakaw
û finda li ber vemirinê
daraza çep çêbûyî
wê ev hînîtiyên me jî biqedin
em ê dubare bimeşin hêviyê
her demsal
dê êdî ne zivistan bin dilêra min

min bi bijangên çavên xwe ve daleqîne
bila çavên te bibin gor ji min re
her dema ku li çavên te meyizandin
bila welatê dilê min bibînin dilêra min
ewê bindest
ewê dilşewat
ewê ji tîna azadiyê stûxwar
kovaniya li te digeriya, di şeveke wiha de
wê dîsa te bîne bîra min, bi halekî jixweçûyî.

Naa, ev ne birîneke ku cebar nedibû û ne êşeke bêqedan,
dê biqedin helbet qolincên ji rojên borî mayî
belkî niha
belkî sibê
belkî ji wan jî zûtir
ji ber vê bikişîne hinavê xwe
bikişîne kûrahiya dilê xwe
vê evînê
vê jiyanê
tehma berXWEdanê xweş e dilgeşa min.

bavêjin aliyekî
xweziyên ku me bi paş xistin
wekî gotinên ku
sêhra xwe winda kirin
dawiya gotinan!
Ev pênûsa jihêzketî
dê gotin nemînin ku
ez pê helbesta te binivîsim
lê ez ê te
bi remzeyan bineqişînim
ji xwîna dilê xwe dilêra min
ji xwîna dilê xwe…
heyv her wê biçirûse
mîna şemala xwedawendîtiya te
wê bigihe me di wextekî de
ew serhildêriya ku
te ber bi me ve li ba kiribû
em ê li benda mirina ku
dê jiyanê hînî me bike bin
ewa dijwar
ku wê me ji hal bixîne

Sînorên ku xwîna me dimêtin. Rê ji rayên laşên me.
XWEBÛN Û YEKBÛN xwedayek bû li perestgeha me…
Axx artêşên mirinê û nexweşiya kuştinê. Çûyîn û hatinên
ku li hev digelicîn. Kovaniya dengan, birînên di hestan de
veşartî. Guleyek ji çekekê dipekiya niha, zaroka li erdê,
giriyê ku ji bajarekî diherikî, wek aşîta çiyayekî yan jî
hezazeke dabelan…

Lanetek e li ezman digere, bi ewran re.
Kêliyek din dê bi me de biteqe ew birûsk.
Navnîşana wê diyar, şida wê berz, hew lavayek hebû ji
binê erdê, vegere min! Dê tu jîn nebûba jîngeh. Pê bihese,
bibîne. Derhozeya wê nehat dîtin. Pêşrewek ji xewnan
diçizire. Bêhna goştên sotî.

Îfadeya heyvê di dêmên rû de nediyar, dil xwe kişand
quncika êşan
kuçe tev aydê wê ne êdî dilêra min.

Gijbûna hestên tazî. Dilê ku xwe avêtiye pişt perdeyê. Ji
bêhna xwebûnê xwe nas dike evîn. Bi qewla ferîşteheke
dilzar.
Pelê ku ji dara jiyanê ket, di destê min de dilêra min,
bayê bêxem ew jî bir
û ji destê min çû her tişt.

Pêtek vedibeye çavên min, tu dizanî,
zehleke ji dûrketinê… Gotina li ser zimanê min dilerizî,
nalînê bêdengiyê…

Perengên min bi ser min de bikin,
xetereyeke li pey min, binivîse Xweda, evê deqek din be li
ser tehtikê eniyê.

Ne îskeîska dawî ye û ne jî kenê pêşîn
reva ku tirsa me wê mezintir bike.

Tirsa reva ji xwe, wêrekiyên ku xwe li kaş didan. Li riyên dabeşbûyî dinêrim û li deryaya nava xwe. Dilopek bi ser mejiyê min de diniqute. Sermaya neçariyê, dicemidim, bêyî ku li awirên te binêrim dilêra min.

Gilgamêşê li nemiriya te digeriya, Manî bû ronahî û
bêhedan derketin keşfa te, li deşta Silêmaniyê
'ROJ'ekê evînek aj kir bi navê VIYAN
her kes niha wê diqîre, wexta berê xwe didan ROJê
Ev gunehkarî dê biqede, ev jibîrkirin
Dema ku bi efsûna te
dilên xwe şuştin bêmirazan
ji bêhêvitiyê

Bi xeyidandina ji jiyanê, di awirên ku di navberê de hatin danîn. Rolek bû dihat domandin lê qediya êdî. Jixweçûn nedibû ku bêav bimîne jî ax.

Kurmê li hinavê min
û çûka ku li ser şaxê direqisî
dengê bayê XWEBÛNê ji hestên te dihat
ez im ê ku pê bûye har.

Tenêtiya li pey me rêz kirî, yadîgara ku ji mehşerê re mayî.
Biqîre, ev der cihê dawî yê cenga me ye. Bes dê nemîne taqeta laşê me ji hezkirinan, ji kelecanan, ji pevçûnan û ji xemgîniyan dilêra min.
Destê ku qevdek gul girtibû ji bo te, birîndar di destê din de dilwelatek li ber fermana te ya dawiyê,
çavên xwe kuta dike li ezman
bi kenê li ser lêvan
hêj find venemirîne dilêra min
perde nehatine xwar
ji nav û xwebûna me re.

razên di paxila çiyayan de veşartî
bêdengiya ezman
îşev dê çirûskek bipeke
ser agirê sorbûyî
birîna xwebûna dilkêş
xayisiya dema ku
li qarînan diket
bi şerûd
neqediyan elemên dil
li taldeyên jibîrbûyî
verişîna hestên bêzar
û gotinên ku bi evînekê ve hildikişiyan
dil bûbûn mertala dawî
tu kefen ji xwebûna me re nebûbû

deryayên hênijok
û dilopên hewceyî çirîskekê
dê bikelin hemû demsal
li ber germahiya çavên VIYANê
leyana xeyalên riknok
têkçûyîna tariya li ber çûyînê
ji dîrokeke bêsiûd
bêhna keserên te dihat
wek neqşên stêrka sarî,
bisekine min nekuje dilêra min
bi heybeta vîna şiyanî
û ev dil her
dê strana te bistirê
li Silêmaniyê
li Heftanînê
bi rakêşiya xwedawendîtiya ROJê

hestek bi em û hêz
hêdî lê bi şid
xwe li qeraxên hebûna me dida
hişê me ji pîroziyan tijî
wateyên ku tofan radikirin
bi çend gotinên xemrî
keşf dikir raza xwebûna xwe
xwedayên bêevd
û evdên bêxweda
di şaşwaziya vê dîlanê de
bila çog deynin niha hemû zanist
ji bilindahiya hebûna me re
ji awirên Dilêra Min re…